Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :967 1-Hezîran- 2022 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# KELECANA MİHRÎCANA GOVENDÊ YA 33.

**Merasima 'Mihrîcanê' ya ku ji ber vîrûsa korona 2 salan hat rawestandin, di navbera 4-5'ê Hezîranê de li bajarê Dûîsbûrg yê almanya tê lidarxistin. Çalakî ji aliyê Govend Eûropa ve tê organîzekirin.**

Amadekariya Mihrîcana 33. ya Govendê ku dîlanên gelêrî yên Kurdistanê lê tên pêşkêşkirin ber bi dawîbûnê ve diçin. Li Mihrîcanê ku îsal 15 tîm ji gelek herêmên Fransa, Swîsre, Hollanda û Elmanyayê beşdar dibin, wê 3 komên zarokan derkevin ser dikê.

Komîteya Amadekar ku derbarê 33'emîn Mîhrîcana Govendê ku ji aliyê Govend Eûropa ve tê lidarxistin de agahî dan. Komîteyê bi bîr xist ku peyva govend bi serê xwe reqs, mûzîk, rîtm û hunera sehneyê ye û got: "Bi hezaran ciwan bi van xebatan bi salan li gorî vê esasê û bi taybetî jî bêyî ku rastiya wan xera bibe, bi çanda xwe hatin cem hev."

Komîteyê destnîşan kir ku komên govendê bi salan e li dijî hemû zêdegavî û bêqîmetkirinên ku modernîteya kapîtalîst pêş xistî û ferz dike têdikoşin û tekez kir ku bi saya vê mîrateya herî bi qîmet hatiye berhevkirin û ev du sal in bi giranî li ser ji nû ve avakirina wê lêhûrbûnek daye çêkirin.

### 4'ê Hezîranê li Dûîsbûrgê

Komîteyê da zanîn ku di pêvajoya belavbûna şewba koronayê de di nava xebatên çand û hunerî de herî zêde qada govendê bandor kir û wiha berdewam kir: "Ji bo ku em vê rewşa valatiyê derbas bikin û komên ku nû hatine ava-



kirin bînin cem hev û di heman demê de vejînek di hemû qadan de biafirînin em îsal Mîhrîcana Govendê li dar dixin. Ji gelek herêmên Fransa, Swîsre, Hollanda û Elmanyayê bi navgînî 15 tîm tevlê mihrîcanê dibin. Îsal wê sê komên zarokan jî cuda derkevin ser dikê û hunerên xwe pêşkêş bikin."

Meşa kevneşopî wê 4'ê Hezîranê saet 12:00'an de li ber Dûîsbûrg Hbf dest pê bike û kom jî heman rojê bi xebatên xwe yên provayê wê amadekariyên xwe temam bikin.

Di 5'ê Hezîranê de wê ligel axaftinên destpêkirinê û peyaman konserên muzîkê bên lidarxistin. Di bernameya muzîkê de Serhado, Tîtalê Feyzo, Rêber Serhat, Koma Xezex û Koma Medî cih digirin. Piştî nîvro jî komên govendê dê performansa xwe nîşan bidin.

### Ji inkara mêtingeriyê re jî bersivek e

Bi taybetî di meha dawî de me dît ku li dijî gelê Kurd û hêzên parastina gelê Kurd hewldanên qirkirinê hatin destpêkirin. Ji aliyekî ve dema şer bê prensîb kûrtir dikin, li aliyê din jî hewldanên qedexekirina ziman û çanda Kurdî êdî derketine holê. Em dizanin ku; van hêzên serdest her tiştê ku dikare jiyanê biguherîne, wê xweş bike û zindîtir bike sûc dihesibîne. Ji ber vê yekê ew vê qirkirinê li ser çanda me ya herî kûr pêk tîne. Çand û hunera me dike sûc û hunermendên ku vê pêk tînin jî dikin sûcdar. Mihrîcana me jî bersiva vê înkarê ye. Em tu carî dest ji çand û hunera xwe bernadin. Em li benda hemû hunerhez û hemû dost û kesên li dijî qirkirinê ne."

*ANF*

# 'Çareserî li malê ye'

**Polîtîkaya zorê ya li ser zimanê kurdî didome û gelê Kurd jî li dijî vê polîtîkayê û êrişan bi xwedîderketina li têkoşînê dibe bersiva van êrişan.**

Zextên li ser zimanê Kurdî didomin û gelê Kurd jî li dijî zext û êrişan bi xwedîderketina li têkoşînê dibe bersiva van êrişan. Nexasim di 15'ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî de dewletê careke din polîtîkayên şer danîn holê û li gelek bajaran destûr neda hunermendên Kurd derkevin ser dikê.

Endama Komeleya Wêje Huner û Çandê ya Jinan (KASED) Salîha Ayata û nivîskar Ronayî Onen polîtîkayên asîmîlasyonê yên dewleta Tirk nirxandin.

Salîhayê got, li welatên din her malbat bi zimanê xwe diaxive û wiha dawî li gotinên xwe anî; "Lê li Tirkiyeyê malbat bi fikara ku wê zarok serketî nebin, bi Tirkî diaxivin. Em neheqiya herî mezin li zarokan dikin. Em wan bi sînor dikin. Heger zarok zimanê xwe yê dayikê bizanibin, wê zimanên din jî baş hîn bibin. Em divê xwedî li zimanê xwe derkevin. Em peywirê didin ser milê saziyan. Jenerasyona nû diçe kursan. Lê ev ne çareserî ye. Çareserî li malê ye. Divê em li malê bi zarokên xwe re bi Kurdî biaxivin. Divê em wisa xwedî li çanda xwe derkevin. Divê em bipirsin gelo li Tirkiyeyê çend zarok bi Kurdî diaxivin? Ji bo Kurdî tine nebe, divê em bi zarokan re bi Kurdî biaxivin."

Ronayî Onen jî bal bire ser rola avabûna nasnameya mirov û got; "Ji bo hebûna Kurd bidome, divê Kurdî zindî bimîne. Dewlet bi ban-



dora jinê ya li ser zimên dizane û ji ber vê zextan li jinan zêde dike. Vê jî wek mêranî û serketinê dibîne. Desthilatdarî dixwaze jinan desteser bike û desthilatdariya xwe mezin bike. Yanî pirsgirêka ziman û pirsgirêka Kurd ji hev cuda nînin. Divê em van her du mijaran bi hev re şirove bikin û binirxînin. Em ê ji bo Kurdî û mafên Kurdan têkoşîna xwe bidomînin. Em ê li dijî zayendperestiyê jî têkoşîna xwe mezin bikin."

*JINNEWS*

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Ajanda (Fransaî) | Bername, rojev, plan, program |
| Bendav | Ciyê ku av lê tê sekinandin. Benda avê, sikir, sike |
| Destwerdan | 1. Tevlîbûna tiştekî di aliyê neyînî de. Mûdaxele: Dest li karê me werdan. 2. Sererastkirina karekî: Dest lê werda, xwe tevlî kir |
| Gundewar | Gund û deverên derveyî bajaran |
| Jêder | Çavkanî, serkanî, ciyê ku tiştek jê tê: Çavkaniya vê nûçeyê ne saxlem e. |
| Jîngeh | 1. Ciyê mirov lê dijîn. 2. Derdor, xweza, tebîet |
| Kanal (Fransî) | 1. Co, ciyê kûr yê av tê re diçe. 2. Dezgeha televizyonê. 3. Rê, rêçik |
| Nexasim | Nemaze, bi taybetî. Dengbêjên berê pir xweş dikirin, nexasim Mihemed Arif |
| Rêje | Mezinayî, pirbûn-kêmbûn, di aliyê dereceyê de girêdana di navbera du tiştan, yan di navbera parçe û tevayiyekê de. Nisbet: Rêjeya xwendekarên serketî ji sedî 80 ye |
| Şênî | Kesên li tax, gund, bajarok, navçe û bajaran dijîn: Şêniyên gund dîlan girtbûn |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Ş | Û | V | ■ | L | A | H | Î | T |
| 2 | E | ■ | Î | D | I | R | ■ | Z | ■ |
| 3 | K | A | N | Î | ■ | A | D | ■ | A |
| 4 | ■ | L | ■ | Z | I | V | I | N | G |
| 5 | N | A | N | ■ | R | ■ | K | A | ■ |
| 6 | Î | ■ | A | X | ■ | A | ■ | L | O |
| 7 | S | Ê | ■ | O | R | S | A | ■ | S |
| 8 | A | M | A | N | ■ | A | L | A | L |
| 9 | N | ■ | B | E | L | ■ | Î | R | O |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | | | ■ | | | |
| 2 | | | | | | | | ■ | |
| 3 | | | ■ | | ■ | | | | |
| 4 | ■ | | | ■ | | | | ■ | |
| 5 | | ■ | | | | | ■ | | |
| 6 | | | ■ | | | ■ | | | |
| 7 | | | | | ■ | | | ■ | |
| 8 | ■ | | ■ | | | | | | ■ |
| 9 | | | | | | ■ | | | |

**ÇEP-RAST**

1. Cama mîkroskopê... Hest û daxwaza tolhildanê
2. Desthilatî, sulte
3. Daçekek ku wateyê xurt dike... Ava qirêj a piştî şûştinê
4. Yezdanekî misrî... Teref
5. Tiştên ku tekildarî reşahiyê ne... Peyva neyînî
6. Notayek... Baneşana ku pê ga tê ajotin û sekinandin... Dema mirov nameyê ji postaxaneyê dişîne li ser zerfê dixe
7. Mehek... Rastêşek
8. Her tiştê têkildarî debara jiyanê
9. Alaya biçûk ku li serê riman dixin... Bi erebî "ez"

**JOR-JÊR**

1. Kanaleke televîzyona kurdî... Beyreq, sembola welatan
2. Şivika darîn a zirav a ku serî tûj e û bi kevan tê avêtin... Dadwer
3. Sendîkaya Karkeran a Swêdê... Cureyekî xwînê
4. Genimê hêrandî... Navê gorên fîrewnan
5. Notayek... Sedemkarê tevgerê, paldêr... Tevgera hewayê
6. Tiştê ku di pileya duyemîn de ye... Dema mirov şîr bidoşe û dest nedê tebaqeya bi ser dikeve, qeymax
7. Bireke pez ku ji 100 hebî heta 200'î... Dirav
8. Ne kevin... Rojek
9. Xizmetkarê ku karê navmalê dike

# `Parastina xwezayê parastina jiyanê ye`

Parastina jîngehê yek ji mijarên herî girîng e û pêwîst e li ber çavan were girtin. Ji bo pêşîgirtina li têkçûna jîngehê û parastina wê, divê civak bi taybetî sazî û dezgehên girêdayî civakê parastina çanda xwezayê bikin û bi hev re herêmeke paqij û ewle ava bikin. *R-6*



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 967 1-Hezîran- 2022 www.ronahi.net/ku/

## `Ragihandina jinê roniya rastiya jinê ye`

Ragihandina jinê ji bo ronîkirin û derxistina rastiya jinê ji bo cîhanê bû çavkaniyek. Rojnamevanên jin yên bakur û rojhilatê Sûriyê dan zanîn ku ji bo redkirin û rûbirûbûna tevayiya komplo û binpêkirinên li ser jinan tên kirin têdikoşin û rastiyê pêşkêşî civakê dikin. *R-2*

# 'Wê ev şer ne wekî Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî be'

## Nûrî Mehmûd: Hedefa yekê herêmên Kurdan in, li pey wê jî herêmên din hene

Berdevkê YPG`ê Nûrî Mehmûd diyar kir ku hêzên parastinê yên herêmê piştî şerê Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî tecrûbeyên mezin girtine û got, şer derkeve wê li hemberî wî şerî rêbaz, îrade û biryarbûneke cuda derkeve holê. *R-4*



## Mihemed Berkel: Hişyarî li ser Lîwa Iskenderoneke din li Sûriyê da

Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Partiya Sûriya Paşrojê şaxê Minbic û gundewarê wê Mihemed Berkel, da zanîn ku dewleta Tirkan ya dagîrker dixwaze li herêmên herî ewle yên Sûriyê "herêmeke ewle" ava bike û hişyarî li ser parçekirina Sûriyê da. **R-5**

## Rojava her roj tê topbarankirin

Dewleta tirkî her roj herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê bombebaran dike û welatiyan direvîne. Li gorî daxuyaniya meclisa leşkerî ya Minbicê di 3 rojên dawî de ji baregehên wan yên eskerî 41 top bi ser gundan de hatine avêtin. ***R-3***



## Kongreya diyaloga lubnanî-kurdî bi encamnameyekê bi dawî bû

Çalakiyên kongreya diyaloga lubnanî-kurdî ku Yekşema borî li Beyrûdê dest pê kiribû, bi encamnameyekê qediya. Di kongreyê de hat gotin pêwîstî bi pêşxistina çanda diyaloga di navbera gel, pêkhate, nasname û baweriyan de heye. **R-3**

## Me li kû çi winda kir!

Sara Kerem

Di vê pêvajoyê de, şerekî pir dijwar li ser gerîlayên azadiya Kurdistanê heye. Dewleta tirkî bi PDK'ê re dixwaze hebûna gerîlayên PKK'ê li çiyayên Kurdistnê tine bike. Ev tişta ku em dibêjin her kes dibêje û rastiyek e jî. Lê gelo armanc tinê gerîla ye û çima despêkê gerîla? *R-5*

## Çalakiya Hefteya Wêjeyî li Qamişlo dest pê kir

Di çalakiya roja yekê ya Hefteya Wêjeyî de semînerek bi navê ''Wêjeya Şoreşê di Navbera Qolincên Zayînê û Jîwariyê de'' hat dayîn. Di semînerê de hat diyarkirin tenê wêje dikare êşa herî dijwar ango êşa bêedaletiyê derxe. Li gorî wê jî divê wêjevanên şoreşê bi fikrê şoreşgerî tev bigirin. *R-7*




## 'Tava Sor' li ser hovîtiya dewleta Tirkan

Rêzefilma "Tava Sor" ku pirsgirêka kurdî, şerê dewleta tirkî, heskirin û têkoşîna Kurdan pênase dike, li rojavayê Kurdistanê hat çêkirin. *R-7*



**Darika Xweziyan**



Sîpan Şînda

*R-7*

**Ewleyî diruşma Erdogan a bêbingeh**



Dilyar Cizîrî

*R-4*

# `Ragihandina jinê roniya rastiya jinê ye`

Ragihandina jinê ji bo ronîkirin û derxistina rastiya jinê ji bo cîhanê bû çavkaniyek. Rojnamevanên jin yên bakur û rojhilatê Sûriyê dan zanîn ku ji bo redkirin û rûbirûbûna tevayiya komplo û binpêkirinên li ser jinan tên kirin têdikoşin û rastiyê pêşkêşî civakê dikin.

**Darîn Silê-Qamişlo**

Di van çend salên şoreşê de ragihandina jinê karîbû sûretê jinê li bakur û rojhilatê Sûriyê biguherîne. Herwiha zimanê weşanê ji nû ve guhert û bi pênûsa xwe rewşa siyasî tehlîl kir û tevayiya şer û êrişên dagîrkeriyê yên li ser herêmê dihatin kirin, dişopand. Di şer de gelek jinên çapemeniyê ji bo derxistina rastiya jin û civakê, canê xwe feda kirin. Bi saya keda jinê di ragihandinê de gelek guhertin li bakur û rojhilatê Sûriyê çêbûn. Rast e hê zihniyeta desthilatdar heye û li gelek deveran dewam dike, lê vê zihniyetê bandor li xebata jinê nekir û jinan li dijî wê xwe û rastiya xwe dan naskirin.

Derbarê rola jinê û girîngiya wê ya di warê ragihandinê de jinên rojnamevan yên bakur û rojhilatê Sûriyê yên ku di warê regihandinê de kar dikin û gelek fedekarî kirine ji me re axivîn, herwiha ev jin ji bo ronîkirina rastiyê, rûbrû gelek zor û zehmetiyan hatine.

Rêvebera ajansa Romav li Şahbayê Neda Ednan diyar kir ku, jinên di çapemeniyê de roleke wan ya mezin di vê pêvajoyê de heye û axaftina xwe wiha domand: "Jin ne di warê pirsgirêkên jiyanê û




yên civakê tenê, di her warî de xebatê dike wek, warê radyo, televizyon rojname û ajansan de kar dike û xwe ispat kiriye. Herwiha gelek pêşketin û destkeftiyên jinê hene."

**`Jinên rojnemavan bi pênûsa xwe zihniyeta desthiladariyê guhertin`**

Neda da xuyakirin ku berî şoreşa Rojava jinê nikarîbû bixebite bi taybetî di warê ragihandinê de û wiha pê da çû: "5 sal in di warê ragihandinê de kar dikim. Berî ku şoreş dest pê bike li herêmên me nedibû jin bixebite û xebata jinê şerm dihat dîtin. Civaka me ji aliyê jinê ve pir teng bû û li gorî serdema berê meyzeyî jinê dikir. Karê ragihandinê tenê ji bo zilam dibû, ji bo jinê qedexe bû. Lê piştî şoreşê gelek guhertin li herêmê çêbûn guhertinên herî mezin ji aliyê jinê ve hatin kirin. Herwiha wek jin di destpêka şoreşê de me karîbû bi riya pênûsa xwe, derkevin derve, hevpeyvînên bi civakê re û bi riya amûrên ragihandinê xwe bi civakê bidin naskirin zihniyeta desthilatdar biguherînin. Ev jî tev bi keda jinê bû."

Nada da zanîn ku jinên li herêmên bakur û rojhilatê



Sûriyê hebûn û rola xwe di warê ragihandinê de ispat kirine û karîbûn ji gelê xwe re bibin cihê çareseriyê û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Jin bi pênûsa xwe ya azad, li pêşiya desthilatdarî, urf û edetên baviksalarî sekinî. Herwiha êş, azarên, êrîş û gefên li ser gelê wan dihatin kirin derdixistin û rewşa civaka xwe ji cîhanê re dan xuyakirin. Ji ber wê jî êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên



li dijî jinê tên kirin berdewam dikin."

Rêvebera ajansa Romav li Şahbayê Neda Ednan di dawiya axaftina xwe de got, Jinê di qada ragihandinê de pêşketineke mezin bi dest xistiye, ji ber wê banga min ji her jina ku di warê ragihandinê de kar dike heye, ku dengê wê bibe dengê çareseriyê, herwiha desthilatdariya baviksalarî netirse û ji bo derbaskirina tevayiya astengiyan hêza û îradeya xwe, tekoşinê mezin bike.

**`Xebata ragihandinê hêz û îradeya jnê mezin dike`**

Endama Radyoya Xabûr Leyla Şêxo jî diyar kir ku piştî ku derbasî qada ragihandinê bû wêrekî, hêz û bixwebaweriya wê zêde bûye û wiha dirêjî da xaftina xwe: "Karê ragihandinê hêz û îradya jinê mezin dike. Di tecrûbeya min ya karê ragihandinê de hêza min zêdetir bû û fikrê min xurttir bû. Hêza jinê ji berê ve heye û pir xurt e, lê nikarîbû vê hêzê derxe. Ji ber wê jî bi riya kar û xebata çapemeniyê rastiya hêza jinê hat xuyakirin. Niha jî wek em dibînin bi sedan jin û ji tevayiya pêkhateyên li herêmê tevlî xebata ragihandinê bûne. Ev bi saya mîrasa jinên me yên berxwedêr e, yên ku niha em li ser şopa wan kar dikin. Gelek jinên me jî rastî êrişan hatin û hin ji wan jî ji bo ronîkirina heqîqetê gihîştin asta şehadetê."

**`Jinên rojnemavan dengê gelê xwe ne`**

Leya axaftina xwe wiha domand: "Li herêmên me yên di binê destê çeteyên DAIŞ'ê de û yên ku ji aliyê dewleta Tirkan ya dagîrker û çeteyên wê ve hatin dagîrkirin, jin rastî destdirêjî, tundî û işkenceyên herî giran hatin, wek ragihandin jinan karîbû bibin dengê wan jinan û kiryarên hovane yên li dijî jinan bigihînin raya giştî."

Endama Radyoya Xabûr Leyla Şêxo di dawiyê de got, tevî astengî û zehmetiyên zihniyeta kapîtalîst jinan dest ji xebata xwe berneda û têkoşîna xwe dewam dikin.

# "Dagîrkirina Kurdistanê, dagîrkirina doza rawa ya gelê Kurd e"

**Êrîşên dagîrkeriyê yên dewleta tirkî yên li ser xaka Başûrê Kurdistanê berdewam dike. Nîvîskar Mujde Elî derbarê êrîşan de diyar kir ku dewleta Tirk li Başûrê Kurdistanê şerê taybet bi rêve dibe.**

Mamoste û nîvîskar Mujde Elî derbarê êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk a li ser xaka Başûrê Kurdistanê ji me re axivî û got: "Dewleta Tirk ji sala 1983'an ve dest bi êrîşên dagirkeriya xaka Başûrê Kurdistanê kiriye, piştî salê 1991'an baregehên serbazî û navendên sîxûrî li herêma Kurdistanê ava kiriye" û destnîşan kir ku dewleta Tirk ji bo Başûr bike milkê xwe êrîşî ser xaka Başûrê Kurdistanê dike.

**"Civaka Başûr bûye dû xetên têkoşîn û nokeriyê"**

Bi nêzbûna dîroka bidawîbûna peymana Lozanê re êrîşên li ser Başûrê Kurdistanê gelek dijwar bûne. Mujde Elî debarê derbarê êrişên dagirkeriyê de axifî û wiha got: "Civak bûye dû xet, xeta têkoşîn ya ji bo berjewendiyê gel e, xeta din jî xeta nokerî û dijminî ye ku dibe sedemê xurtbûna êrişên dagirkeriyê yê li ser xaka Kurdistanê. Divê gelê me nebe beşek ji xiyanetê, divê hemû kes li hemberî van êrîşan derbikevin û li dijî nokeriyê bisekinin."

**"Dagirkirina Kurdistanê, dagirkirina hemû fikr û destkeftiyên gelê Kurd e"**

Nivîskar Mujde Elî da zanîn ku divê gel bikare bibe xwedî helwest, bi çalakî, xwepêşandan û nerazîbûnan dengê xwe bilind bikin û nekevin bin bandor şerê taybet a ku dewleta Tirk a dagirker hercarê vê yekê dike. Mujde Elî axaftina xwe wiha berdewam kir: "Dagirkirina Kurdistanê, dagirkirina hemû fikr û destkeftiyên gelê Kurd e. Dewletên dagirker naxwazin li her parçeyek a Kurdistanê xebatên zindîkirina doza azadiyê û avakirina serxwebûnê bê meşandin. Hewil didin vî gelî



tune bikin, di demên bûrî de êrîşî Rojavayê Kurdistanê kirin û hîna jî gefê êrîşan li ser Rojava dixwin û hewil didin ku xwerêveberiya xweser ya ku di cîhanê de nimuneyê pergala netewa demokratîk e ji holê rakin."

*JINHA*



# Çalakiya Hefteya Wêjeyî li Qamişlo dest pê kir

Di çalakiya roja yekê ya Hefteya Wêjeyî de semînerek bi navê ''Wêjeya Şoreşê di Navbera Qolincên Zayînê û Jîwariyê de" hat dayîn. Di semînerê de hat diyarkirin tenê wêje dikare êşa herî dijwar ango êşa bêedaletiyê derxe. Li gorî wê jî divê wêjevanên şoreşê bi fikrê şoreşgerî tev bigirin.

Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê dest bi rêzeçalakiyên `Hefteya Wêjeyî` a bi dirûşmeya "Wêje Vedenga Êş û Hêviyên Civakê ye" kir. Çalakî bi beşdarbûna nûnerên ji Rêveberiya Xweser, TEV-DEM, yekitiyên nivîskar û rewşenbîran li hola El-Burc a li Qamişloyê dest pê kir.

Hola çalakiyê bi wêneyên nivîskar, wêjevan û rewşenbîran, bi pankarta bi nivîsa `Wêje; Kaniya Derbirîn û Afirandina Civakê ye` hate xemilandin.

Çalakî bi deqeyeke rêzgirtin dest pê kir. Paşê Berdevka Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Narîman Evdikê axivî û bixêrhatina haziran kir.

Narîman Evdikê da zanîn ku armanc ji rêzeçalakiyan nîqaşkirina li ser wêje û pirsgirkên ku ji pêşketina wê re dibin asteng re ye û got: "Nivîskar, rewşenbîr û wêjevanên me yê li Heleb, Şehba û Kobanê ji ber rewşa ewlehiyê mixanbin nikarîbûn beşdarbûbana. Dê mîna `Heftiya Wêjeyî` salan e be û di salên bê de li bajarên cuda bê lidarxistin."

Piştre li ser navê Rêveberiya Xweser, Cîgira Desteya Çandê Ronahî Hesen jî axivî û da xuyakirin ku wêjevan balyozê hezkirin û aştiyê ne li cîhanê, bi nivîsên wan rastî li derdorê tê belavkirin.

Piştî axaftinan semînera bi navê ''Wêjeya Şoreşê di Navbera Qolincên Zayînê û Jîwariyê de'' ji aliyê nivîskar û helbestvanên Kurd- Kemal Necim û Beşîr Mele Newaf ve hat dayîn.

Beşîr Mele Newaf da zanîn ku ew hewcedarî xurtkirina xalên lawaz di wêje û wêjevanan de ne û




wiha got:"Wêje beşek ji hunerê ye. Huner û wêje dikarin êşa herî dijwar anku êşa bêedaletiyê derxin pêş çavan. Heke mirov bixwaze civakekê nas bike divê bi rêya wêje û hunerê naskirinê esas bigire, ne bi rêya siyasî ji ber ew rê xwe li ser bingeha hevpeymana dide diyarkirin.

Beşîr Mele Newaf da xuyakirin ku wêjeya kurdî heta niha di 5 qonaxan re derbasbûye: "Qonaxa wêjeya devokî, kilasîk, eqlan e, hizrê neteweyî ku ji salên 1930 di nava xwe de serhildanên Kurdan anku ji hewara Celadet Bedirxan dest pêkiriye heta salên 1980`î, qonaxa sala 1990-2011`an ku tê de wêjeya kurdî di dergehên nû geriya û bendên qirkiirna Kurdan qutkiriye anku bingeheke ji mîrasa Kurdan daye."

Beşîr Mele Newaf destnîşan kir ku xitaba wêjevaniyê ji ya siyasetmedaran dûr e û wiha pê de çû: "Ji ber ku ya wêjeyî bêhtir ber bi dil û can ve diçe. Xeyal di wêjeyê de bê sînor in û wêjeya bi xeyal di asoyeke bê dawî de ye. Rewşa wêjeyê li Rojava li şûna ku mil bi milê rewşa heyî bisekine, beşeke ji wêjevanan bi buhaneyan xwe ji berxwedan û tekoşîna heyî vedikşînin, berovajî wê em dikarin di vê serdemê de wêjeyeke hêja bidin."

**`Pêwîst e wêjevan li xwebûna xwe vegere`**

Kemal Necim jî diyar kir ku ji navê semînerê tê naskirin ku pêwîstî bi derxistina mijara wêje û şoreşê heye û li ser jî nîqaş bê kirin.

Kemal Necim anî ziman ku wêje berpirsyarê serkeftin û binkeftina şoreşê ye, di Şoreşa Rojava de guherîneke hêja û mezin heye tê de bi hezaran bûyerê civakî hene û got: "Hin wêjevan hene li gorî fikrê xwe bûyerên civakî paşguh dikin, da ku van bûyeran bi giştî bibînin gerek vegerin xwebûna xwe anku li rastiya xwe vegerin."

Kemal Necim bal kişand ser ziraviyên ku gelên di Şoreşa Rojava de dimînin hîs dikin û got: "Kî ji wêjevanên me êşa di hinavê hezker, dê û bavên şehîdên me derxistiye, her wiha divê wêjevanên me di rewşa kêmderftiyan de jî viyan û vîna aşiqên axa xwe derxîne. Wêjeya me nebûye wêjeya civakê."

Kemal Necim da zanîn ku ji bo wêje bibe wêjeya civakê pêwîstî bi pêşxistina çanda xwendinê, weşangeriyeke pîşeyî û zêde girîngiya pênasekirina pirtûkan di ragihandinê de heye.

Piştre mafê nîqaşê ji bo nivîskar, helbestvan, wêjevan û rewşenbîrên ku beşdarî semînerê bûbûn hat dayîn û diyar kirin ku pêwîste warê rewşenbîrî ji warê partîtî dûr bikeve, ji ber ev yek wê rewşê bighîne aloziya çandê û rewşenbîrî. Divê bêhtir wêjevan nêzî êşa gel bibin da ku gel jî wan bişopîne û berhemên wan bixwîne. Di şoreşê de jî divê wêjevan xwedî fikreke şoreşgerî be.

Dûvra têkildarî Şoreşa Rojava ji aliyê; Fîxan Hîmo û Ednan Hesen ve helbest bi zimanê kurdî, Feyrûz Reşik û Tamir El-Şemerî helbest bi zimanê erebî hat xwendin.

Hefteya Wêjeyî wê heta 2`ê Hezîranê bi semîner û panelên cuda dewam bike.

*ANHA*

# 'Tava Sor' li ser hovîtiya dewleta Tirkan

**Rêzefilma "Tava Sor" ku pirsgirêka kurdî, şerê dewleta tirkî, heskirin û têkoşîna Kurdan pênase dike, li rojavayê Kurdistanê hat çêkirin.**

Rêzefilma "Tava Sor" ku pirsgirêka Kurd, şerê dewletê, hezkirin û têkoşîna Kurd pênase dike, li Rojavayê Kurdistanê hat çêkirin. Ev rêzefilm ji 16 xelekan pêk tê û lîstikvanên wê hemû ji Rojavayê Kurdistanê ne ku weke cara yekem karê lîstikvaniyê di rêzefilmeke wiha de dikin. Niha çêkirina vî rêzefilmê bi dawî bûye û di demeke nêz de wê li ser ekranên Stêrk TV were nîşandan.

Ji bo rêzefilma "Tava Sor" berî sal û nîvekê, li bajarê Dêrikê yê Rojavayê Kurdistanê girtina dîmenan dest pê kiribû. Rêzefilm ji aliyê du derhêneran ve tê çêkirin. Ev jî Teymûr Avdikê û Andog Nûman in. Senarîstê wê şehîd Bawer Botan e. Ev rêzefilm behsa gelek mijaran dike; xeta welatparêziyê, xeta xiyanetê û xeta têkoşînê. Her wiha di nav de hest, berxwedan û hêza jinan jî xuya dibe. Heft xelekên wê yên destpêkê behsa şerê li Cizîra Botan ê di navbera dewletê û gelê Cizîrê de dike. Xelekên din behsa piştî şer dike ku dewletê zexteke çawa li ser ciwanan dike. Jinên têkoşer di nav vê rêzefilmê de rola xwe baş şirove dikin. Her xelekek serpêhatî û çîrokekê vedibêje û di heman demê de rastiya çand û welatparêziya Kurd derdixe pêş.




Lîstikvanên rêzefilma "Tava Sor" têkildarî armanca rêzefilma xwe dibêjin: "Me xwest êş û zilma ku li Bakurê Kurdistanê ji aliyê dewletê ve tê kirin, bi civaka xwe re parve bikin."

**'Hovîtiya dewleta Tirkan vedibêje'**

Lîstikvan û her wiha amadekara beşa dekorê, Roza Ibrahîm behsa tecrubeya xwe ya nava xebatê sînemaya Kurdî kir û got, "Piraniya dema xwe me di nav kar de derbas kir ji bo wê bidawîbûna wê hem ji bo min cihê kêfxweşiyê ye hem jî dibe sedema peydabûna hestên nexweş jî.

Xweş e ji ber ku me encama keda xwe dît û nexweş jî bû ji ber me du hevrêyên xwe yên herî bi qîmet ku sitûna vê rêzefilmê bûn ji dest dan. Ev rêzefilm ji me re bû bingehek ku zêdetir em di xebata sînemayê de xwe bi pêş bixin, ava bikin û jê re bibin pêşeng. Me xwest êş û zilma li Bakurê Kurdistanê ya bi destê dewletê Tirk, bi civaka xwe ya Rojavayê Kurdistanê re parve bikin û rastiya hovîtiya dewleta Tirk ku niha li vir jî heman yekê dike, bi rengekî zelal û zêdetir nîşanî civakê bidin."



**'Ji bo me şensekî mezin bû'**

Lîstikvan Nejbîr Osman jî tevlîbûna xwe ya rêzefilma "Tava Sor" wiha îfade dike: "Ev cara yekem e ez tevlî xebata sînemayê dibim, berê ev xebat çawa dihat kirin, me nizanibû û weke gelê Rojavayê Kurdistanê berî şoreşê qet di xeyala me re jî derbas nedibû. Bi şoreşê re gavên girîng hatin avêtin ji bo me jî şansekî mezin bû em cara yekemîn cihê xwe tê de bigirin. Çîroka me ya rêzefilmê pirr girîng bû berxwedana Cizîra Botan me da nasîn û me ti cudahiya wê ji berxwedana Rojavayê Kurdistanê nedît, ji ber ku li ku derê êriş, zilm û zordarî hebe, êşa gel heye û li hemberî wê berxwedan heye."

*JINHA*



## Darika Xweziyan

Sîpan Şînda

Xwezî loriyek bûma li ser zimanê dayîka xwe, di landikê de bihejiyam. Xwezî stiranek bûma li ser zimanê bavê xwe, di wan gelî û newalên kûr de deng veda û şêr û pilingan ji levftigên xwe baz bidana. Xwezî çîrokek bûma li ser zimanê bapîrê xwe ku her tim di tûrikê xwe de bigerandama. Xwezî bendek bûma di kuçke û civatan de û guhdaran li min guhveçîngî bikira, bila carnan jî dilop bere bikiran û guhdarî min bikiran. Xwezî aşkîlokên sêv û karçînan bûma û di denê diya xwe yê kesk de ji bo şevên payîz û zivistanê di quncikên tarî û mezelên derî miftekirî de bihatama hilanîn. Xwezî payîzokek bûma li ser zimanê dengbêjan di şevbihêrkan de biherikîma li ser dilên kul. Xwezî helbestek bûma ji hibra pênûsa hozanan û li ser lêvên evîndaran bihatama honan. Xwezî pariyek nanê tisî bûma di destê zarokên pêxwas de li kolanên bajarê min di bin qijîna tava Temîz û Tebaxê de dilehîzin. Xwezî têlek ji bisk û keziyên te bûma yarê û geh li ser eniya te de bihatam xwarê û geh li ser milên te ber bi jêr ve daheliyam. Xwezî ramûsenak bûma li ser gardena yarê, di binê qulfên guhara. Xwezî xweziyek bûma li ser zimanê xwezî xwaza. Xwezî, xwezî, xwezî….

Belê xwezî ji perçeyek yê jiyana me Kurdan e. Em bêxwezî nikarine bijîn. Em diçin nava cihê xwe em xweziyan dixwazin, em ji xew radibin em xweziyan dixwazin, em bi rê ve diçin em xweziyan dixwazin; hema bêje hemî saet û gavan em dibêjin xwezî û xwezî. Lê ka çire em hinde dibêjin xwezî û xwezî? Di serî de em civakek bê tedbîr in û em her tiştî dihêlin hêviya Xwedê ve. Dema li gorî dilê me jî neçe, em paşê dibêjin xwezî min wisa nekiribûya. Em deriyê mala xwe dihêlin vekirî û em dibêjin de ka xem nake ma wê çi bibe. Paşê diz dikevin mala me em jî dibêjin xwezî min deriyê xwe mifte kiribiya. Em zarokên sê-çar salî berdidin kolanê û em dibêjin bila ji xwe re bilîzin, paşê seyareyek li wan dide û em ji dibêjin xwezî min stûyê xwe bişkanda min nehêla ew biçe kolanê. Em ji ber tiştekî tine devjeniyan dikine û paşê ji şerî dikin, em hevdu birîndar dikine û dikujin, paşê jî em dibêjin xwezî me wisa nekiribûya. Em siwarê cihê heqê wê 100 km be li ser 180 km diajon, paşê em qeza dikin û em dibêjine xwezî min ewqas bilez ne ajotibiya. (Heke em sax jê bifelitin). Em her tiştî dikin û paşê jî em jovan dibine û em dibêjin xwezî wisa çênebûya, xwezî min wisa nekiribûya, xwezî, xwezî, xwezî…

Ka ez ji we re bêjim, xwezî we tedbîrên xwe di dema xwe de bigirtan, xwezî we seyare di hedê wê de biajota, xwezî we zaroka 3-4 salî tenê nehişta di kolanê de, xwezî we deriyê xwe kilît bikira, xwezî we ji ber tiştên pûç şer nekira… Bes xweziyan bixwazin, êdî Xwedê jî şaqis maye û nizane bi kîjan xweziyên we ve bibeze. We dît, min li jorê ewqas xwezî xwestin, lê bi Xwedê kim yekê jî pêk nayne. Bavê min, 'darika xweziyan ber negirtiye (pê ve nehatiye)'!

# `Parastina xwezayê parastina jiyanê ye`

Parastina jîngehê yek ji mijarên herî girîng e û pêwîst e li ber çavan were girtin. Ji bo pêşîgirtina li têkçûna jîngehê û parastina wê, divê civak bi taybetî sazî û dezgehên girêdayî civakê parastina çanda xwezayê bikin û bi hev re herêmeke paqij û ewle ava bikin.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Derbarê mijarê de Hevserokê Rêveberiya Xwecihî û Ekolojî ya Herêma Cizîrê Silêman Elî Ereb ji me re axivî û behsa girîngiya ekolojiya herêmê û projeyên ji bo parastin û pêşxistina wê kir.

**`Ekolojî lingekî bingehî yê Neteweya Demokratîk e`**

Silêman Ereb di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser girîngiya Ekolojiya herêmê û wiha got: “Di sîstema me de ekolojiya herêmê bi qasî demokrasiyê girîng e. Çimkî ekolojî lingekî bingehî yê Neteweya Demokratîk e. Mirov bê xwzayê nikare bijî. Xweza her tişta jiyanê di nava xwe de dihewîne. Ji bo wê jî pir girîng e ku em vê xwezayê biparêzin. Lewra parastina xwezayê parastina jiyanê ye.”

**`Têkoşîn û berxwedana me tev ji bo parastina ekolojiya jîngehê ye`**

Silêman da zanîn ku êriş û aloziya heyî, bandorê li xwezaya herêmê dikin û axaftina xwe wiha domand: “Çend sal in herêma me di nava alozî û şeran de ye. Rojane êrişên dagîrkeriya tirkî û çeteyên wê li ser herêmên me hene. Ev rewş jî bandorê li ekolojiyê dike. Aramnca dewketa tirkî ya dagîrker ew e ku xweza têk biçe û jiyan li herêmê nemîne. Berî niha jî ji ber ku rejima Sûrî, ji bo xwezayê tiştek pêş nexistibû, xwezaya herêmê paş ketibû û di rewşke pir xirab de bû. Ji bo wê jî wek desteya ekolojî em li gorî derfetên xwe, hewl didin pêşketineke baş di xwezayê de çêkin û rewşa ekolojiyê bidin guhertin.”

**Projeyên parastina ekolojiya jîngehê**

Silêman Ereb behsa projeyên ji bo pêşxistin û parastina ekolojiyê kir û wiha got: “Îsal ji bo paqijiyê me li seranserî herêma Cizîrê projeyeke taybet pêk anî û hin zagonên paqijiyê hatin derxistin. Hewldanên me hene ku em erebeyên mazotê û jeneratorên li kolanan kêm bikin, çimkî ev bandoreke mezin li ekolojiya xwezayê dikin. Herwiha projeyên me yên ji bo çandina daran jî îsal pêk hatin. Projeya çandina daran ji bo pêşxistin û parstina jîngehê weke bingehekî girîng e. Çimkî bi çandina daran rewşa hewayê zelal dibe û parastina paqijiya herêmê tê kirin. Me gelek dar li seranserê herêmê çandin û hin projeyên me ji bo daristanan jî hene. Herwiha komîteya me ya tenduristiyê jî heye, wê li tevayiya kargeh û bazarên xwarinê bigerin û rewşa paqijiyê bişopînin, da ku xwezaya me paqij bimîne.”





Hevserokê Rêveberiya Xwecihî û Ekolojî ya Herêma Cizîrê Silêman Elî Ereb bang li gel kir ku li çanda paqijiya xwezayê xwedî derkevin û got, çimkî kar û xebata me tev ji bo gel e û axaftina xwe wiha qedand: “Hêza herî mezin hêza gel e, pêwîst e gel parastinê bike. Eger gel alîkar be wê xwezaya me paqij be û wê rewşa tenduristiyê jî baştir be. Divê malbat jî zarokên xwe li ser vê çandê mezin bikin, da ku em karibin civakeke rast û demokrat ava bikin.”

# Desteya Rêveberiya Herêmî û Jîngehê li Reqayê rêya kamyonan sererast dike

**Desteya Rêveberiya Herêmî û Jîngehê ya Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê rêya kamyon û sehrîcan ya Selam heta gundê Marûde û rêya Reqa-Eyn Îsa sererast dike.**


Bi armanca sivikkirina qerbalixa li tax û bajarokên bajarê Reqayê, Desteya Rêveberiya Herêmî û Jîngehê rêya Reqa-Keramê sererast dike.

Endamê Daîreya Xizmetguzariyê ya Desteya Rêveberiya Herêmî û Jîngehê endezyar Îhab Hemid ji ajansa me re plansaziya 2022`yan eşkere kir û got: “Îsal em ê bi dirêjahiya 34 kîlometreyan rêya Menaxir-Marûde heta rêya Reqa-Eyn Îsa ya di navbera rêya M4 de sererast bikin.”

Têkildarî girîngiya vê rêyê Îhab Hamid got: “Sererastkirina vê rêya girîng e, ji ber ku alternetîfa rêya Keramê-Reqayê ye ku wê hemû erebeyên bazirganiyê, kamyon û sehrîc di vê rêyê re derbas bibin û qerbalixa li taxên Reqayê bi dawî bibe. Her wiha ew ê qarbalixa li ser rêya Reqa-Keramê jî sivik bibe.”

Dirêjbûna rê 34 kîlometreyê ye û bahbûna wê jî 8 metre ye. Xebatên sererastkirina rê ji beriya mehekê ve dest pê kir û niha jî bi dirêjbûna 16 kîlometeryan kevir û xîz lê tê reşandin, piştre wê were qîrkirin.

Hamid wiha axaftina xwe dewam kir: “Projeyên din jî hene. Di rojên pêş de em ê rêya Til Seman a bakurê Reqayê sererast bikin, her wiha em ê projeya rêya Selam a par berdewam bikin, ji ber ku sala derbasbûyî me qonaxa yekemîn bi dawî kir û îsal em ê dest bi qonaxa duyemîn bikin.



Em ê bi dirêjbûna 155 kîlometreyan û stûrbûna 8 cm qîr bikin û rê bi qasî 12 metreyan berfireh bikin.”
Piştî ku dewleta Tirk a dagirker rêya M4 li pêşiya welatiyan girt, rêya Selam (Ebyed) tevgera çûn û hatinê hêsan dike

***ANHA***

# Komîteya Tenduristiyê ya Reqa têkildarî nexweşiya iltîhaba çermê mejî bang kir

**Komîteya Tenduristiyê ya Meclisa Sivîl ya Reqa di çend rojên dawî de nêzî 400 rewşên nexweşiya iltîhaba çermê mejî (Sehaye) tomar kiribû. Endamê komîteyê Ebûd El-Bidêwî bang li welatiyan kir ku li gorî tedbîrên xweparastinê tev bigerin.**

Di demên dawîn de li bajarê Reqayê û gundewarê wê nexweşiya iltîhaba çermê mejî (Sehaye) belav bû, nexasim di nava zarokên kêmî deh saliyê de.

Têkildarî mijarê endamê Komîteya Tenduristiyê ya Meclisa Sivîl a Reqayê Ebûd El-Bidêwî ji ajansa me re axivî û anî ziman ku di demên dawîn de nexweşiya iltîhaba çermê mejî (Sehaye) li bajarê Reqayê belav bûye.

El-Bidêwî da zanîn ku beriya niha Komîteya Tenduristiyê ya Meclisa Sivîl a Reqa 380 rewşên vê nexweşiyê tomar kiribû, piraniya wan zarokên kêmî deh saliyê bûn.

El-Bidêwî destnîşan kir ku ji ber guhertina avhewayê yê vê dawiyê li herêmê ev nexweşî belav bûye.

El-Bidêwî diyar kir ku nexweşiya îltîhaba çermê mejî (Sehaye) zêde ne metirsîdar e û dermanê wê heye û wiha dewam kir: “Lê divê nexweş 15 rojan di bin kontrolê de be ku bi temamî baş bibe. Ger germahiya laşê zarokan bilind bû, serêşî çêbû yan jî laşê wan tevzî divê serî li navendên tenduristiyê yan jî doktorekî bidin.”

El-Bidêwî bang li gelê Reqa û gundewarê wê kir ku li gorî tedbîrên xweparastinê tevbigerin, destên xwe bişon û li paqijiya zarokan hayedar bin. Her wiha destnîşan kir ku divê dûrî kesên nexweş bikevin û derziyên taybet bistînin. Ji ber ku ev nexweşî bi rêya oksejînê û bikaranîna alavên nexweşan tê vegirtin.

Têkildarî hewldanên Komîteya Tenduristiyê ji bo pêşîlêgirtina vê nexweşiyê, El-Bidêwî got, “di dema niha de Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) tîmek erkdar kiriye da ku navên pêketiyên vê nexweşiyê li Reqa û gundewarê wê tomar bike ku hîn zêdetir nexweşî belav nebe.”

***ANHA***






# Rojava her roj tê topbarankirin

Dewleta tirkî her roj herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê bombebaran dike û welatiya direvîne. Li gorî daxuyaniya meclisa leşkerî ya Minbicê di van 3 rojên dawî de ji barergehên wan yên eskerî 41 top bi ser gundan de hatine avêtin.

**Navenda Nûçeyan**

Li gorî çavkaniyên herêmî, MÎT’a Tirk li Cindirêsa Efrînê ciwanê bi navê Nîzar Mihemed Bozan (25) revand. Ev ciwan dema ji bo pêdiviyên xwe çû Efrînê li benda kontrolê ya di navbera Efrîn û Cindirêsê de hate revandin.

Di heman demê de bomberdûman jî bênavber didome. Dewleta Tirk gundên Um Hoş û Wehşiyê yê Kantona Şehbayê bomberdûman kir.

Li gorî daxuyaniya Meclîsa Leşkerî ya Minbîcê jî dewleta Tirk a dagirker di sê rojên dawîn de şeş gund bomberdûman kiriye.
Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: “Artêşa Tirk a dagirker bi hawan û çekên giran gundên Hoşeriyê, Tûxar, Mihsenlî, Um Cilûd, Seyade û Yalinliyê bomberdûman kiriye.

Artêşa Tirk 3 rojên dawîn de jî ji baregehên xwe yên nêzî gundên Tûxar, Hoşeriyê, Yaşilî û Şêx Nasir 41 top avêtin. Bi rêya van êrişan dixwazin aramî û jiyana civakî têk bibin.”



# Kongreya diyaloga lubnanî–kurdî bi encamnameyekê bi dawî bû

**Çalakiyên kongreya diyaloga lubnanî-kurdî ku Yekşema borî li Beyrûdê dest pê kiribû, bi encamnameyekê qediya. Di kongreyê de hat gotin pêwîstî bi pêşxistina çanda diyaloga di navbera gel, pêkhate, nasname û baweriyan de heye.**

Li ser banga Navenda Lubnanê ya lêkolîn û şêwermendiyan, Partiya Yekîtiya Suryanî ya Cîhanî, Weqfa Newroz a Çanda Civakî, Komeleya Wekhevî-Werde Butris û Weqfa Jîn a Jinan bi diruşmeya” Ber bi jiyaneke hevbeş û hemwelatîbûneke wekhev ve” li paytexta Lubananê Beyrûdê roja Yekşemê kongreya diyaloga lubnanî-kurdî dest pê kir.
Di kongreyê de zêdetirî 70 delege ji hemû herêmên Lubnanê ji hemû nasname, netew, ol û pêkhateyan amade bûn.

Deqeya rêzgirtinê li ser sirûdên neteweyî yên lubananî û kurdî dest pê kir, piştre axaftina komîteya amadekar hat kirin û peyama yek ji damezrînerên destpêkê yê diyaloga Erebî-Kurdî hat xwendin Dr. Ebdulhisên Şaban hat xwendin, û li peyamên deng ên Dr. Saed Mihyo hat guhdarkirin.
Di beşa yekê ya kongreyê de, behsa krîz û dozên gelên herêmê hatin kirin, di beşa duyem de jî behsa çareseriyên bingehîn ên aloziyan hat kirin.
Di encamnameyê de wiha hate gotin:
“ Ev kongre di qonaxeke dîrokî ya girîng ji bo Lubnan û herêmê de pêk tê. Li herêmê şerên bi armanca desteserkirina karînên gelan ji aliyê dewletên xwedî berjewendî ve pêk tê, pêkanîna vê kongreyê li Beyrûtê paytexta fikira azad û jiyana aştiyane bi armanca pêkanîna diyaloga di navbera pêkhateyên cuda yên Lubnanê de ye.

Bê guman, nakokiyên cîhanî û herêmî bandorên wê li ser rewşa me heye, taybet Lubnan. Di encama van krîzan de sîstema global hewl dide ji krîza heyeî derkeve, ew jî bi rêya nexşekirina jinûve sînorên herêmê ji aliyên siyasî, civakî, çandî û erdnîgarî ve û dûrî vîna gelên herêmê ji Ereb, Kurd, Ermen, Suryan-Asûr û Drûzan. Ev gelên resen ên li herêmê nayên jihevkirin. Bi sedema dîrok û çanda hevbeş ku wan li hev kom dike. Sedema mayîna wan jî çanda wan a hevbeş a bi dirêjahiya hezaran salan heta roja îro ye.

Digel vê krîz û aloziyê me gelek dozên Lubnanê û herêmê nîqaş kirin, me girîngî da nasnameya rasteqîn a hemû pêkhate û gelên herêmê. Pêkanîna kongreyê bi xwe hewldanek ji bo lêgerîna li çawaniya derketina ji vê krîza neteweyî, olî û pêkhatî ye, ya ku dewlet-netewe li dijî jiyana hevbeş a gelan pêk tîne.
Di kongreyê de li ser doza azadiya jinê hate nîqaşkirin ku hewl dide xwe ji bindestiyê rizgar bike, tevî ku berê jin di dîrokê de di warê pêşketina şaristanî û mirovî de li Lubnan û herêmê xwedî rol bû.
Di kongreyê de hate misogerkirin çareserî di pêkanîna biratiya gelan û pirrengiya çand, nasname û yekitiya jinan de ye. Her wiha rizgarkirina ji rewşa biyanîbûnê bi vegera li rihên dîrokî, çandî û şaristanî ya li herêmê ye û ji ber wê divê ev yek pêk werin;




1-Kongre soz dide ku ew ê çanda hevqebûlkirin û îtîrafa bi hemû netewe, çand û pêkahteyan bike û wê weke dewlemendiyekê bibîne.
2-Kongre teqez dike ku rêya çareserkirina doz û nakokiyên li Lubnan û Rojhilata Navîn, diyalog e, ne bi rêya ceng û şerê çekdarî ye. Li ser wê teqez dike ku projeya “Neteweya Demokratîk û dewleta hemwelatîbûn” ji bo avakirina pêşeroja herême bingeh e, navenda aştî, demokrasî û azadiyê ye.

3-Armanca kongreyê parastin û pêşxistina nirxên çandî, demokratîk, civakî û siyasiya hevbeş a gelên herêmê ye.
4-Kongre teqezî li ser girîngiya pêşxistina diyaloga çandî ya dîrokî di nava gel, nasname, çand û baweriyên li Lubnanê de kir û ji bo wê daxwaza avakirina komîteyekê ji rewşenbîran dike.

5-Kongre siyasetên dewletan ên derxistina dijminatiyê di navbera gel û nasnameyan de, bi rêya komên neteweyî, pêkhate û olî, teşhîr dike.
6-Kongre piştgirî dide azadiya jinê û beşdariya wê di hemû waran de, her wiha li dijî tundiya li ser jinê ye.
7-Kongre girîngî dide redkirina siyasetên dagirkeriya Tirk li herêmê, li dijî bi karanîna ol ji bo pêkanîna berjewendiyên weke avakirina “Osmaniya nû” ye.

8-Kongre soz dide ku têkoşîna li dijî siyasetên navendî dewam bike, ew siyaset di avakirina dewleta hewmwelatîbûnê li ser bingeha nasnameya niştîmanî de bi bin ket.
9-Kongre bawer e ku demokrasî û piştdayîna nimûneyên nenavendî ya berfireh an jî Rêveberiya Xweser a Demokratîk ji bo sazûmaneyên rêveberiyê garantiya pêşxistina azad li welat e û çareyên herî baş ji bo parastina pirrengî û cihêrengiyê ye.

10-Kongre dibîne ku pêwîstiya dewleta hemwelatîbûnê ya nû, têkliyên di navbera gelên Kurd û Ereb û hemû gel û pêkhateyên de ye, bêyî ku mafê tu kesî bê binpêkirin.
11-Armanca kongreyê israrkirina li ser pêkanîna diyalog û nîqaşan di dema nakokiyan de dike.

***ANHA***

# Nûrî Mehmûd: Hedefa yekê herêmên Kurdan in, li pey wê jî herêmên din hene

## Berdevkê YPG`ê Nûrî Mehmûd diyar kir ku hêzên parastinê yên herêmê piştî şerê Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî tecrûbeyên mezin girtine û got, şer derkeve wê li beramberî wî şerî rêbaz, îrade û biryarbûneke cuda derkeve holê.

Gefên dewleta Tirkan yên dagirkirina herêmên nû yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdewam dikin, ku li seranserî herêmê heya niha êrişên dagikeran ranewstiyane. Li kêleka vê jî guhertina demografîk li herêmên di bin dagirkeriyê de jî didome. Li dijî van gefan û polîtîkayên qirkirina gelên herêmê, gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û şervanên wê di nav liv û tevgera şerê gelê şoreşgerî de ne.

Têkildarî êriş û gefên dewleta Tirk a dagirker, Berdevkê Yekîneyên Parastina Gel (YPG) Nûrî Mehmûd ji ajansa me nirxandin kir.

Nûrî Mehmûd, diyar kir ku li gor xuya dike dewleta Tirk ji bo êrişan çireya kesk wergirtiye û got: "Niha li Rojava bi taybet herêmên Kurdan hedefa dagirkeran a yekemîn e, lê li pey wê Heleb, Mûsil, Kerkûk heye."

**'Gefan em cidî dest digirin'**

Nûrî Mehmûd diyar kir ku ew gefên hikumeta AKP-MHP`ê li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê cidî dest digrin û sedemên wê wiha parve kir: "Yek, di hundirê Tirkiyê krîzên aborî, siyasî, dîplomasî heye ku ev rejîm êdî nikare hakîmiyetê li ser çêbike. Ya duyem jî Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku karibû şoreşa demokratîk biparêze û ji Sûriyê re bibe model. Ev jî li pêşiya projeyên Erdogan yên faşîst û cîhadîst bû kelem. Ji lewra êrişeke muhtemel cidî ye ji ber ku derveyî vê çareyekî din a vê rejîmê tune ye. Dixwaze hem vê projeyê têk bibe hem jî nexşeya Mîsaqî Millî ya ku xeyal dike vegerîne. Rewşa gelê Tirkiyê di aliy jiyanî de gelek zehmet bûye, her wiha gendeliya ku rejîma AKP-MHP`ê di hundirê Tirkiyê de pêk tîne ger şerek tune be wê biqulibe ser wî. Şer ji bo vê rejîmê girîng e ku bikaribe di hundirê Tirkiyê de rewşa awarte bidomîne û hemû aliyên dijberî xwe bêdeng bike. Ji ber wê gefên bi rengî gelekî cidî ne.

**'Xuya dike li hinek cihan çireya kesk girtine'**

Ji îhtîmal zêdetir Erdogan di nav hewldan û tevgereke cidî de ye ku bikaribe cîhanê îqna bike û vê êrişê pêk bîne" bi van gotinan Nûrî Mehmûd destnîşan kir ku Erdogan li benda firsedekê ye û wiha berdewam kir: "Tirkiye berendamê Ewrupa ye û endamê NATO ye. Ji vê dixwaze sûd werbigre. Ger îmkanên wî tune bin jî li ser pişta Ewrupa û NATO vî şerî bide meşandin. Erdogan firsetekê bibîne wê êriş bike, ji xwe behs dike ku wê êriş bike. Ev jî li gor ku xuya dike li hinek cihan çireya kesk wergirtine."

**Herêmên Kurdan hedefa yekê ne, lêbelê..**

Dewleta Tirk ji bo dagirkeriya xwe rewa bike her behsa parastina sînor dike. Têkildarî van daxuyaniyên dagirkeran Nûrî Mehmûd anî ziman ku bêgûman niyeta Erdogan ji mijara sînor zêdetir, ew e ku bigihêje Heleb, Kerkûk, Mûsilê. Nûrî Mehmûd balkişand ser herêmên ku gef lê tê xwarin û got: "Nexşeya Mîsaqî Millî ji nûve çêbike. Piştî wê jî derbasî nexşeya Osmanî bibe. Lê çima bi taybet herêma me hedef digre? Ji ber ku ev herêmên sînor herêmên Kurdan in, di vê mantîqeyê de projeyên demokratîk ên ku bikaribe pêkhateyên Sûriyê li derdora xwe kom bike pêş ket. Ji bo wê destpêkê dixwaze vê herêmê têk bibe û hedefên xwe yên din pêk bîne. Niha Rojava bi taybet herêmên Kurdan hedefa wan a yekemîn e, lê li pey wê Heleb, Mûsil û Kerkûk hene."

**'2 milyon û nîv koçber li herêmên me hene'**

Derbarî polîtîkayên dewleta Tirk yên li ser koçberan û projeya bicihkirina wan Nûrî Mehmûd ev tişt anî ziman: "Beriya niha ewqes koçber ji Xota û herêmên din anîn û li Efrînê bi cih kirin, guhertina demografîk li herêmên dagirkirî pêk anî. Her wiha çeteyên navnetewî jî anîn bi cih kirin. Mînak Ebû Bekir El-Bexdadî, Ebû Ibrahîm El-Qureyşî û gelek serçeteyên DAIŞ, El Qaîde, Îxwan Muslîmîn li van cihan bi cih kirin. Komên bi navên cûda jî bi cih bûne. Ji bo wê tiştên li wir kirine niha dixwazin li herêmên ku Rêveberiya Xweser bi rê ve dibe jî pêk bîne. Cîhan jî dizane ku zêdetirî 2 milyon û nîv koçberên Sûriyê yên ji Dêrazor, Hums, Idlib û Şamê di herêmên me de bi cih dibin. Ji xwe ji sedî 40 hemwelatiyên Sûriyê li van herêman bi cih bûne. Ji lewra hincetên ku Erdogan tîne ziman wekî bikaribe sînor biparêze, koçberên Sûriyê vegerîne Sûriyê, divê ev koçber vegerin malên xwe, ne herêmên me ku bikaribe demografiyê bigûherîne û projeya ku karibe civaka Sûriyê li derdora xwe kom bike û bû hêviyek ji bo gelê Sûriyê bi giştî, têk bibe."



**'Li gorî îtîfaqê tev bigerin'**

Li dijî van polîtîkayên dewleta Tirk û gefên wê Nûrî Mehmûd balkişand ser sekna hikumeta Şamê û hêzên garantor yên li herêmê û got: "Hikumeta Şamê ne xwedî wê îradeyê ye ku bikaribe tiştekî bike. Niha bi saya Rûsya hinek hêzên Şamê di herêmên me de ne, ev yek bi navbeynkariya Rûsya ye. Ji hêzên rejimê zêdetir hêzên garantor Rûsya, Amerîka an jî Koalîsyona Navneteweyî ye. Piştî şerê Serêkaniyê itifaqeke hat çêkirin ku ev welatên garantor li gor vê itifaqê tevbigerin. Divê bi erkên xwe rabin."

**'Em êriş nakin ew êriş dikin'**

Nûrî Mehmûd, diyar kir ku hincetên dewleta Tirk yên tînin rojevê ne rast in û got: "Amerîka û Rûsya jî şahide ku artêşa Tirkiyê îmkanên NATO`yê bi kar tîne, bi çek û teknolojiya herî pêşketî rojane êrişî Rojava dike. Di van êrişan de hemwelatiyên me tên hedefgirtin, zarok, xebatkarên Rêveberiya Xweser, mal û milkên gel tên hedefgirtin. Bi hezaran binpêkirin ji aliyê Tirkiyê ve bi teknîka NATO`yê li herêmên me tên pêkanîn, civaka navneteweyî şahide. Ji lewra tu rastiya ku dibêjin em êriş dikin tune ye, ew êriş dikin, di aliyê bejahî de ji aliyê Eyn Îsa û heta Til Temir, Şehba, Til Rifet, êrişî wan deveran dikin."


**'Wê ev şer ne wekî Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî be'**

Nûrî Mehmûd, da zanîn ku ger şerek derbikeve wê li beramberî wê uslub, îradeyeke cuda derkeve holê û ev tişt lê zêde kirin: "Bê guman, sekna me sekna şerê gel ê şoreşgerî ye. Hêzên me YPG/YPJ û QSD`ê bi giştî wek saziya ku erka parastina rewa ji şoreşê girtiye, dê di wê çarçoveyê de tevbigere. Hêzên me piştî şerên Efrîn, SErêkaniyê, Girê Spî tecrube girtin û xwe li gorî wêna birêxistin kirin ku bikaribin parastina herêmê bikin. Şerek derkeve, wê ne wek şerê Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî be, wê bi uslubekî cuda, bi îradeyek cuda bi biryarbûneke cuda derkeve hole."

**'Gel wê parastina nirx û destkeftiyên xwe bike'**

Nûrî Mehmûd bang li gelê herêmê jî kir ku xwe li gorî vê rastiyê birêxistin bike û got: "Wekî ku li hember terora DAIŞ`ê çawa dest bi parastina xwe kir, bi ser ket û civaka Sûriyê, civaka cîhanê li derdora xwe kom kir, pêwîst dike li hember faşîzm, tundrawî û terora dewleta Tirk û komên ji bermahiyên El-Qaîde, DAIŞ, Îxwan Mislimîn em li vir car din têk bibin. Bawer dikin ku gel û hêzên me di vê qenatê de xurt bûye ku xwe dispêrin hêza xwe û wê parastina nirx û destkeftiyên xwe bike."

***ANHA***



## Ewleyî diruşma Erdogan a bêbingeh

**Dilyar Cizîrî**

Dewleta Tirk ji destpêka aloziya Sûriyê ya 15'ê Adara sala 2015'an ji Dera ya li başûrê Sûriyê çirûska wê ronî da, dest bi fen û planan kir. Ji rojên destpêkê ve bi pişgirî û hevkariya hemû welatên NATO, Erebistana Siûdî, Qeter, Urdin û gelek welatên din diruşmên meşan û planên çekdarkirina tevgerê saz kirin. Ji bilî kanalên Tv yên welatên erebî gelek kanalên xeta Birayên Misliman û islama nerm jî vekirin û dest bi propegandayê kirin.

Vê tevgera wan heta radeyeke mezin cih girt û heta astekê projeyên xwe pêk anîn û komên çekdar li seranserî Sûriyê ava kirin. Wê demê dewleta Tirkan hevkariya xwe ya bi desthiladata Bees û malbata Esed re da aliyekî û bi hemû hêza xwe dijberiya gelê Sûriyê kir.

Di vir de gelê Kurd karîbû fersendê bi kar bîne û hêza xwe ya parastinê YPG/YPJ'ê ava bike. Wan herêmên xwe parastin û sîstema xwe ya demokratîk li ser esasê Neteweya Demokratîk ava kirin. Dewleta Tirk bi navê ewleyiya xwe ya neteweyî dest plan û êrişên berfireh ên di hemû aliyan de kir. Qaşo mijar ewleyiya Netewî bû, lê dewleta Tirkan di demeke kurt de bi dehezaran çeteyên radîkal ên ji hemû aliyên cîhanê derbasî Sûriyê kirin. Her wiha komên cûda cûda ava kirin û wan ji bo dijberî û şerê li dijî gelê Sûriyê xistin dewrê.

Dema komên wan nikarîbûn plana wan pêk bînin, Cebhet El-Nusra di êrişên li dijî Rojava de xistin dewrê. Paşê DAIŞ û komên girêdayî wan danîn ser kar û herêm bi temamî ji wan re berdan. Di dema hêzên cîhanê û di serî de hevkarên sereke yên dewleta Tirk feriq kirin, DAIŞ ewlehiya wan dixe xeterê, di şerê Kobanê de dev ji piştgiriya projeya dewleta Tirk berdan û piştgiriya ezmanî dan YPG/YPJ'ê yên li Kobanê evsaneyên dîrokî di şerê li dijî DAIŞ'ê de xêz dikirin.

Di wir de pêngava têkçûna planên dewleta Tirk êdî bi encam dibû û nakokiyên wan û hevkariyên wan destpê kir. Gelê kurd hîn zêdetir li ser esasê xeta netewa demokratîk, tekoşîna xwe bilind kir û gelên herêmê bi tevahî anîn gel hev. Ev bi avabûna QSD'ê û têkçûyîna DAIŞ'ê li ser erdê li Baxozê bi encam bû.

Dewleta Tirkan û serokê wê Erdogan dema DAIŞ'ê bi sedan kîlometir dirêjahî li ser sînorê Tirkiyê bû û di ser sînorê wan re êrişî Kobanê û herêmên Rojava dikir, bi hemû hêza xwe piştgirî dida çeteyên DAIŞ'ê û bi tu awayî nema behsa ewlehiya xwe ya netewî kir. Dema şervanên YPG/YPJ'ê û paşê QSD'ê herêm ji çeteyan rizgar kirin, careke din ewlhiya netewî ya Erdogan û dewleta wî bû rojeva cîhanê û di bin vê behanê de bi xwe li şûna wêkîlên xwe yên têkçûyî DAIŞ'ê û Cebhet El-Nusra dest bi êrişê kir.

Ev êrişên wan bi hevkariya Rûsiya û Amarîka bû û planên wan bû sedema Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî ji aliyê dewleta Tirk ve werin dagirkirin. Paşê Erdogan careke din gotina ewle, lê vê carê behsa herêma ewle û avakirina wê kir. Armanca Erdogan ji herêma Ewle ewe ku çeteyên DAIŞ'ê û malbatên wan ên ji ber êrişan koçber bûne, di wan herêman de bi cih bike.

Wiha jî armanca Erdogan zindîkirina dewleta DAIŞ'ê û têkbirina ezmûna Rêveberiya Xweser e. Vê jî di bin navê herêma ewle de bikar tîne. Li pişt perdeya ewlehiyê guhertina demografî pêk tîne û planên xwe yên sed salê li ser gelê herêmê feriz bikin. Lê vê carê diyar e projeyên Erdogan û giringiya wî ya siyasî hêdî hêdî têk diçe û hevkarên wî hewl didin hêdî hêdî helwestê nîşan bidin. Ev bi şerê Rûsya û Ukrayna zêdetir dikeve rojevê. Ev jî wê di rojên pêş de baştir diyar bibe.



# Mihemed Berkel: Hişyarî li ser Lîwa Iskenderoneke din li Sûriyê da

## Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Partiya Sûriya Paşrojê şaxê Minbic û gundewarê wê Mihemed Berkel, da zanîn ku dewleta Tirkan ya dagîrker dixwaze li herêmên herî ewle yên Sûriyê "herêmeke ewle" ava bike û hişyarî li ser parçekirina Sûriyê da.

Dewleta Tirkan ya dagîrker bi armanca guhertina demografîk û tirkkirina herêmê, gefa pêkanîna êrişeke din li ser nakur û rojhilatê Sûriyê dixwe.

Ev yek piştî hefteyekê ji ragihandina plana Erdogan a bicihkirina milyonek penaber li herêmên dagirkirî yên Sûriyê pêk hat.

Li ser vê yekê Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Partiya Sûriya Paşrojê li Minbic û Gundewarê wê Mihemed Berkel got: "Ji dema damezrandina Rêveberiya Xweser ve, welatî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi ewle û îstîqrar dijîn û tu binpêkirinên QSD'ê li dijî dewleta Tirk tune ne. Lê dewleta Tirk ji destpêkê ve ji civata navneteweyî dixwaze herêmeke ewle li van herêman ava bike."

Mihemed Berkel pirsî û wiha domand: "Gelo herêmên Sûriyê yên dewleta Tirk ji Cerablus heta bi Idlibê dagir kirine, herêmên ewle ne? Na li wir tu ewlehî tune ye, her tim şer û nakokî hene. Ew îdîa dike ku parastina ewlehiya xwe dike, bi wê re Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî dagir kirin. Lê di rastiyê de hewl dide van herêman tev li Tirkiyê bike. Ew jî binpêkirina peyman û mîsaqên navneteweyî ne."

Berkel diyar kir ku li Tirkiyê krîzên navxweyî û têkçûna lîreyê heye. AKP ji bo ku di hilbijartinên 2023'yan bi bin nekeve de, dixwaze krîzên hindirîn bi îdiaya parastina ewlehiya xwe derxe derve.

Der barê armancên dewleta Tirk de jî Berkel got: "AKP dixwaze aliyên hundir razî bike, ji ber muxalefet dixwaze penaberên Sûriyê vegerîne Sûriyê. Lê AKP 2 dixwaze 2 armancan bi carekê de pîk bîne, him ji penaberan xilas bibe him jî bi vê yekê pere ji welatên alîkariya penaberan dikin bi dest bixe."

Mihemed Berkel destnîşan kir ku dewleta Tirk bi darê zorê dixwaze penaberan vegerîne û ev tişt anî ziman: "Eger rastî dewleta Tirk dixwaze penaberan vegerîne, divê daxwaza çareseriyeke aştiyane bike û bibe aliyekî xwedî niyetên baş. Her kesê dixwaze vegere welatê xwe, ne li Cerablus an jî Girê Spî yan jî herêmên din. Ev ne vegera penaberan e. Ev derxistina bi darê zorê ye û neçarkirina wan li herêmên dagirkirî ye ku armancên xwe pêk bîne , demografiya van herêman biguherîne."

Mihemed Berkel bang li civata navneteweyî bi taybet Koalisyona Navneteweyî û Rûsyayê kir ku erkên xwe bi cih bînin û rê li ber dewleta Tirk bigirin.

Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Partiya Sûriya Pêşerojê li Minbic û Gundewarên wê Mihemed Berkel di dawiyê de got: "Em avakirina avahiyên mêtîngeriyê li ser xaka xwe qebûl nakin, ew dixwazin weke Lîwaya Skenderon herêmên din ji Sûriyê dagir bikin. Divê gel bi hemû pêkhateyên xwe rastiya dewleta Tirk nas bike."

***ANHA***



## Me li kû çi winda kir!

**Sara Kerem**



Di vê pêvajoyê de, şerekî pir dijwar li ser gerîlayên azadiya Kurdistanê heye. Dewleta tirkî bi PDK'ê re dixwaze hebûna gerilayên PKK'ê li çiyayên Kurdistnê tine bike. Ev tişta ku em dibêjin her kes dibêje û rastiyeke jî. Lê gelo armanc tinê gerîla ye û çima despêkê gerîla?

Niha ezê bêjim 'xeyal bikin ku êrişeke tinekirinê li ser PDK'ê û gelê Başûr heye, ka wê demê tevgera PKK'ê wê çi kiriba. Lê ne pêwîst e ku kesek xeyal bike. Tiştekî ku çêbûyî, tinê em bîr bînin bes e... û ez bawer im ne pêwîst e ez bêjim dema êrişên DAIŞ'ê, eger PKK nebûya tiştek bi navê Kurd û Kurdistanê nedima, ne jî ti deskftî diman. Herwiha ji bo Iraq - Sûrî û giştî Rojhilata Navî heman tişt derbasdar e. Wê niha Rewşa herî baş ya giştî Rojhilata Navî wek ya Efgxnistanê bûya. Ji derveyî belgeyên heyî, tinê her kesê xwedîwijdan wê demê hinekê bîne bîra xwe bes e.

Lê di vê pêvajoyê ku dewleta tirkî bi hêza NATO re dixwaze deskeftiyên Kurdan bi qirkirineke mezin ji holê rake. PDK'ê ji cîhanê re da xuyakirin ku ne partiya gelê Kurd e û berjewendiyên gelê Kurd jî ji bo xwe xeter dibîne. Lewra eger ji destê wê bê hazir e xaka Kurdistanê giştî bifiroşe dijminê Kurdan û bi dewleta tirkî re gelê Kurd di qirkirinekê din ya dîrokî re derbas bike. Dibe ku hin kes watê nedin vê rastiyê, lê zelal e ku PDK li ser navê partiyekê kurdî ji bo hilweşandina gelê Kurd, ji aliyê hêzên hegemon ve tê birêvebirin. Êdî ew bixwe vê rastiyê itîraf dike. Rojavayê Kurdistanê jî di nava dorpêçekê de pariyê ku ji devê dijmin hatî xilaskirin e. Lê ji aliyê dewletên hegemon ve di nava dorpêçekê pir mezin da ye û ev hêz dixwazin paşroja vê serkeftinê (şoreşê) wek ya başûrê Kurdistanê bikin. Ango hêza eskerî û rêveberiya wê bibe amûrekê wan ku sîstemekê teslîmkirî, ji berjewendiyên gelê xwe dûr; dîlgirtiya berjewendiyên hêzên derve wek PDK'ê bikin. Bêguman li hemberî vê projeya qirêj, têkoşîn û berxwedan heye, lêbelê ne di asteke pir xurt de ye. Ji ber ku pir kesan di asteke jor de xwe ji hişmendiya teslimiyet û koletiyê xilas nekiriye û hin caran tê jibîrkirin ku ev şoreş bi fikr û hêza gerilayên azadiyê (PKK'ê) nebûye ne dihat avakirin, ne jî heya niha li ser lingê xwe dima.

Hêzên hegemon ji gelê Kurd bêtir dizanin ku heya PKK neyê lewazkirin, an jî neyê bêbandorkirin ti hêz û hebûn nikarin gelê Kurd û deskeftiyên wan tine bike, ev tiştekî ispat kiriye. Lewra hêza NATO ji bo ku PKK'ê tinê lewaz bike derfetên xwe hemû seferber kirîne.

Niha li gorî heqîqeta heyî, gelê Kurd bi hemû deskeftiyên xwe re bûye armanca dijminê xwe yê har û di xetereke mezin de ye.

Wê demê em pirs bikin, gelo piştî deskeftiyên Kurdan ku di nava lepê çeteyên DAIŞ'ê, bi hêza gerilayên PKK'ê hatin derxistin, me li kû çi şaş û winda kir ku dewleta tirkî ya bi zîhnîyeta DAIŞ'ê karî li berçavên cîhana ku li hember DAIŞ'ê diricifî û serkeftina Kurdan pîraz dikir, dest bi planên qirkirina Kurdan bike? Bêguman Dema mirov tiştek winda kir, heya ku li cihê windakirî lênegere nikare wî tiştê xwe bibîne.

Hêzên navneteweyeyî bi derew û kompoyên zirav, PKK xistin nava listeya terorê. Piştî ku PKK'ê çeteyên DAIŞ'ê şkandin jî heman hêzan li çepikan da û xwe kirin şirîkê vê serkeftinê. Herwiha dewleta tirkî ya faşîst jî wê demê tevizîbû. Lêbelê dîsa jî PKK ji listeya terorê nehat derxistin û ya qedexekirî û nefermî jî dîsa ew bû, çima?

Ji ber ku despêkê gotin, artêşa ku tê avakirin an jî gerilayên şoreş ava kirîn, nabe bi cilên gerîla biminin! Êê dilê me Kurdan hinek zêde paqij e, qet û qet me dîroka xwe neanî bîra xwe, me got `rast e ma şerê me û şoreşa me ne bi cilan e' û me cil danîn. Piştr e gotin, 'hinek xalên ku we rizgar kirine bila di destên we de be, lê bila filan hêza fermî tê de hebe- ji bo ku kesek êrişî we neke!' Şûna ku em bêjin ,çima em fermî nabin; me got 'rast e ala me ne fermî ye, ev ala fermî li vir be wê baştir be' hwd û hwd. Niha jî dibêjin eger cihên di destê we de hûn radest nekin, emê bi şer, bi qirkirinê ji nav destên we derxin!

Bi kurtayî me di tavîza despêkê de (ya cilûbergên gerîla) winda kir. Wan got, me jî li çokê xwe da! Ji bo hêzên desthilat tavîza piçûk û mezin nîne, tavîza herî piçûk dibe ku bibe windayiya herî mezin...

Niha dîsa bi xêra gerîlayên azadiyê me lingê xwe li erdê şidandiye ku em êdî tavîzê nedin, lê rewş pir cuda bûye. Ev tinê têrê nake, divê em li gorî dijwariya dijminê xwe bi biryara ku em ji niha wê de ti car 'paş de gavavêtinê qebul nakin' û li her cihî êrişî dijminê xwe yê hov bikin. Ji ber ku ji vê gavê û wêde tiştekî ku Kurd ji windahiya wê bitirsin nemaye, berovajî vê yekê eger Kurd bi şik û tirs tevbigerin dibe ku her tişt bê windakirin! Gerila lewaz bibe wê Rojava jî hemû deskeftiyên xwe winda bike; cihekî ku Kurd hebûna xwe lê biparêzin namine. Divê ev tirs bi taybetî di dilê gelê Rojava de hebe, ji ber ku êşa piştî rizgarkirinê dîsa windakirin li Efrînê hat jiyîn û divê bi tevgerandineke zelal soza namûsê bê dayîn ku ev yek dîsa neyê dubarekirin.